Kampanya navnetewî ya CHAK ê dest pê kir:

Zarokên Kurdan yên zindanan de serbets berdin

Dezgeha mafê mirovan ya li dijî jenosîdê Kurdocide Watch-CHAK, di civîna xwe ya navendî de biryarek giring da. Li gorî biryarê, kampanya navnetewî ya CHAK ê, li bakurê Kurdistanê ji bo azadiya zarokên Kurda yên di hepsa de dest pê kir.

Di civîna duhî de ji 12 welatan niwênerên komîte û komelayên CHAK ê beşdar bûn. Her wisa di hema kombûnê de, civîna Dadgeha Navnetewî ya Sucdaran-ICC li Kurdistanê ku CHAK hevkarê wê ye, bû cihê niqaşê. Di civîna CHAK ê de, Cigîrê Serokê Giştî yê CHAK ê, rojnamevan Gabar Çiyan raporek taybetî li ser rewşa zarokan pêşkêşî endaman kir.
Çiyan, li ser kampanya hatiye destpêkirin, dîtina xwe wisa anî zimên:
”*Di konaxa endambûna Turkiyê ya Yekîtiya Ewropa-EU de gelek qanûn hene ku divê bêne guhertin. Hejmarek ji wan li dijî paymanên mafê zarokan yê navnetewî ne, ku Turkiyê bi xwe îmze kiriye.*
Turkiyê, bi qanûna terorê û Dadgeha Cezeyên Giran, zarokên kurda bi sucê terorê, bi dehan sal ceze dike. Hetanî niha li dijî bi hezaran zarokên kurdan dawe hatine vakirin û hejmarek bilind ji wan di zindanan de ne. Ji bo piştgiriya zarokên Kurda û çareseriya pirsê kampanya CHAK ê ya navnetewî dest pê kiriye. Du daxwaziyên me hene û divê bi zutirîn wext li ber çava bêne girtin:
- Kanuna terorê benda 5, 7, 17 li dijî peymanên navnetewî ne û divê bêne rakirin. Her wisa heman qanûn bendên 9, 13 li dijî zarokên Kurdan neyên bikaranîn. Qanûna 5237 banda 220/6-7 û 314/4 li dijî peymanên navnetewî ne û divê bêne rakirin.
- Zarokên Kurdan ku bûna qûrbanên qanûna terorê û ya 5237 ê û niha di zindanan de ne, divê serbest bêne berdan. Daweyên li dijî wan hatine vekirin, bi dawî werin.”
Serokê Giştî yê CHAK ê Goran Halabcayî anî zimên ku, *ew ê kampanyayê li seranserî Ewropayê fireh bigirin û di gel dezgeh û şexsiyetên hevkar gavên pêwîst bavêjin.* Halabcayî bi berdewamî wisa axifî: *Kampanya CHAK ê dê ji aliyê CHAK-Bakur ve bê rêvebirin*.
Kordînatorê CHAK-Bakur Seyidxan Anter li ser pirsê wisa axifî: *Cihê kêfxweşiyê ye ku rapora CHAK-Bakur di civîna giştî de hate niqaşkirin û biryara kampanyek navnetewî hate dayîn. Mîna gelek welatên Ewropa, li Parlementoya Swêdê jî xebatên me didomin û em hizir dikin ku li ser pirsê konferansek navnetewî pêk bihênin.*

CHAK-Navenda Dokumentasyonê & EuroKurd News